

“Rasan” piro-
jeyeke nîştimanî
û giştgîr »»» R:6



Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siyasaî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (341)05-01-2018 Buha (1000) Tûmen

**Rejîma Îranê bixwe, wê
serê xwe bixwe**



Maika Pompeo Wezîrê Derve ê Amerîkayê di daxuyaniyekê de hişdarî daye Komara Îslamî ku dawiyê bine bi bînpêkirina biryarnameyên Konseya Ewlekariyê ya NY bo xwe rizgarkirin ji îzolebûna siyasî, û aborî, û dev ji çalakîyên mûşekî berde.

Di vê daxuyaniyê de hatiye: Wezaretê Parastina rejîma Îranê dixwaze ku sê mûşekên metirsîdar di çend mehên bê de biceribîne. Çalakîyên mûşekî ên rejîma Îranê bînpêkirina biryarnameya 2231 a Konseya ewlekariyê ye, ku ew yek jî, rê pê nedayî ye. Rejîma Îranê hewl dide ku aramiya cîhanê têk bide, ku ew yek ji aliyê Amerîkayê ve nahê qebûlkin.

“Maika Pompeo” Wezîrê Derve ê Amerîkayê di gotûbêjekê de digel kanala televîzyonî ya “Newsmax”ê de jî ragehandiye: Em berdeyam dibin li ser siyaseta xwe ya rast li hemberî Îranê de, jiber ku bi baweriya me xelkê Îranê hêjayî vê yekê ne ku jiyanekê serdemiyane hebin, ne eva ku di bin postal rejîmeke serberedayî de bijîn. Nîgeraniyên Amerîkayê dijkiryara Komara Îslamî li pey xwe hebû, û di vê derheqê de Cewad Zerîf di “twitt”ekê de Amerîka wekî bînpêkarê biryarnameya 2231`an tohmetbar kir, û got: Amerîka di vê astê de nîne, ku bixwaze bi vî awayî li ser me baxive. Hevdem digel berdewamiya zext û givaşan bo ser Îranê, pasdar Qasim Teqîzade cihîrê Wezîrê Parastinê ê rejîmê ragehandiye ku ew amade ne li hemberî êrişên Amerîka

هێزی پێشمه‌رگه‌ی کوردستان
Kurdistan`s Peshmarga Forces



**Gelo em çima kêm caran
behsa PDKÎ dikin?**

»»» R:5

Îxanet û siyaset

»»» R:2



**Gelo bandora Îranê li Îraqê
zêde dibe, yan gihîştîye asta
xwe ya herî bilind**

»»» R:4



**Şûjinê di çavên xwe
de nabînin!**

»»» R:7



**Zewaca zû û bi
Zorî!**

»»» R:8



û Îsraîlê de li ber xwe bidin, û piştê xwe jî, zêdetir girê didin bi wan hêzên xwe, ku di Îraq, Sûriye, Yemen û welatên din de -bo kiryarên tîkderane- bi kar anîne û şer kirine.

Herwisa “Benjamin Netanyahu” serokwezîrê Îsraîlê jî di civîneke xwendekaran de ragehand: Zêdereviyên rejîma Îranê bûne sedema vê ku em û Amerîka erk û wezîfeyan di navbera

»»» R:2

Sergotar

Îxanet û siyasî

N: Kerîm Perwîzî

Siyasetê di nava dîrok û pêvajoya ber bi pêşveçûn yan şikesta netewe û gelên cîhanê de, pênasê û reng û rûyên cur bi cur bi xwe ve girtiye, û di qonaxên cuda ên dîrokî de, li gor rewş û xwendinê cuda, pênasê û berhevdanê cuda bo têgeha siyasî hebûne.

Di dîroka Îranê û bi taybetî dîroka serdem de jî, netewên nav erdnîgariya Îranê bi awayekî digel têgeha siyasî berbirû bûne, ku di dehikên derbazbûyî de, siyasî li cem neteweyên Îranê, wekî têgehekê ye bo derevkerin û firt û fêlkerina li hevdu bûye, û vê yekê jî paşxana dîrokî ya xwe heye, ku hem di edebiyata kevn ya farsî de, siyasîbaz wekî keskef fêlker û hîlebaz hatiye binavkirin, û siyasî li cem hakimîyan pêk hatiye ji bikaranîna mirovan û piştî jî avêtin û piştguhîstina wan! Di sedsala borî de jî li derbarê Qacar û Pehlewî de, dek û dolabên Rûs û Îngilîzan xûya û navûdeng hene, lewra siyasî di Îranê de bûye derevkerin û xapandin!

Lê di pênasîya zanistî û bi lêni-hêrîneke lojîkî de, siyasî pêk tê ji mifahwergirtin ji hemû îmkân û şiyana bona bidestxistina berjewendîya giştî û pêşveçûna civakê. Lewra jî dewlet wekî ekterên qada siyasî, hewla bidestxistina zêdetirîn berjewendiyê bo welatê xwe didin. Lê siyasî ji dîtingeheke atîfî û îdeolojîk ve pêk tê ji bibawerbûn li hemberî îdeyekê, û zêdetir ji dîtingeha hest û bawermendî û pêbendbûna îdeolojîk ve çav lê tê kirin. Lewra jî hêzên kurdî di pêvajoyê qonaxên dîrokî de gellek caran hest kirine, ku dewletan îxanet bi wan kirine!

Îxanet di atîfê û pêwendiyekê bihest, yan îdeolojîk de xwe nîşan dide, û ji dîtingeheke real û hevserengîya hêz û danûstandina deskevîtan û berjewendîyan ve, êdî

»»»» Doma manûetê

xwe de, li dijî rejîma Îranê parve bikin. Erkên malî û aborî li stûyê Amerîkayê dibin, û Îsraîl jî erk û wezîfeya berbirûbûna leşkerî li hemberî rejîma Îranê de digre pêş.

Ew şerê devkî ê di navbera Amerîka û Îsraîl û Îranê de, di demekê de ye ku Komara Îslamiya Îranê di warê aborî de gelek şepirze bûye, û vê meselê jî, hawara tundreya bilind kiriye. Her di vî warî de, Nadir Qazîpûr bi nav nûnerê Urmiyê di meclisa rejîmê de, dibêje ku hewceyî

Amerîka û Îsraîlê nake, rejîma Komara Îslamî ya Îranê bi destê xwe û xelkê ji nav diçe.

Derheq bûdceya diyarîkirî ya dewletê bo sala bê dibêje: Di bûdceya sala 1398'an de dibe ku %10 a karmendan bêne derkirin, %10 a perwerdehiyan bêne daxistin, zanko bêne hilweşandin, û ji Rûsiyê wameke 5 milyar Tûmenî bê wergirtin.

Pêştir jî Hesên Xomêynî di Husêyniyeya Cemarî de axavtin kiribû, û ragehandibû: "Xîm û koka her civakê, exlaq, û

hestkirina bi razîbûna xelkê ye". Wî gotiye ku dibe em bizanin sedemên manê çi ne, hekî em nezanin tu garantiyek nîne ku em bimînin, û wê meydanê ji me bistînin.

Herweha Faîze Haşimiyê Refsencanî keça terorîstê naskirî ê rejîma Îranê Elî Ekber Haşimiyê Refsencanî, û nûnera pêşîn a meclisê, ew yek êşkere kir ku rejîma Komara Îslamî di nav xwe de rizî bûye, û hekî bi berçav rûxana wê hest pê nahê kirin, eva bi vê sedemê ye ku xelk ji siberoja xwe nîgeran in, û nizanin ku piştî Komara Îslamî

Aliyên opozîsyonê ên Belûçistanê di derbarê madeyên hişber de hişdariyê didin rejîmê


Ali û saziyên opozîsyonê ên Belûçistanê derbarê bêngdarkirina xortên Belûç bi madeyên efyûnê ji aliyê navendên hikûmetê ve, bi taybetî li dibistan, xwendingeh, razangeh û zanîngehan, bi çendîn daxuyanî û raportên cuda hoşdariyê didin navendên hikûmetê û bi taybetî rêveberatiya Perwerde û Barhênanê.

Tevahiya partî û aliyên siyasî ên opozîsyona Belûçistanê derbarê tûşkirina xortên Belûç bi madeyên hişber ji aliyê navendên hikûmetê ve, bi taybetî li dibistan, xwendingeh, razangeh û zanîngehan, bi çendîn daxuyanî û raportên cuda hoşdariyê didin navendên hikûmetê û bi taybetî rêveberatiya Perwerde û Barhênanê.

Saziya SAHAB (Saziya Yekdengîya Nerazîtiyê Belûçan) ku taybet bi rêxistinî nerazîtiyên Belûçistanê ye û pêkhatiyên cuda ên civaka Belûçistanê bi armanca pêşxistina xebata sivîl a xelkê

Belûçistanê û rizgarkirina wan ji rejîmê rêxistinî dike, di malpera xwe de raportek derbarê kurte vîdyoyekê belav kiriye ku tê de xortên Belûç li polên xwendingeh û dibistanê, têne hînkirin ku çawan madeyên efyûnê bi kar bînin.

Di raporta Saziya Yekdengîya Nerazîtiyê Belûçan SAHAB de amaje bi hînkirin û hebûna wan madeyan li xwendingeh û dibistanan hatiye kirin û ev sazî tekezê jî dike ku "Tiştê ku niha heye, encama çil salan rêvebirina saziya Perwerde ji aliyê wê kesê e ku xelkê navçeyê nîn e. Herwisa berpîrsên bilind ji çavdêriya rewşê nekirine û di encamê de li dewsa perwerdekirin û barhênanê xwendekaran, ew di polên



xwendinê de hîn dibin ku çawan madeyên hişber bi kar bînin."

Vê saziyê herwisa ragihandiye "Ji bo ku êdî xortên Belûç nekevin nava pîlanên qirêj ên rejîma Îslamî a Îranê, pêwîst e hikûmetê neavendî bê avakirin."

tiştêk bi navê îxanet tune, eva tu yî ku berjewendiyên xwe baş li hev cuda dikî û kîvş dikî, yan jî berjewendiyên netewe û nîştimana xwe dikî qurbanîyê pêwendiyekê atîfî yan îdeolojîk!

Ji vê lênihêrîne ve, êdî baskirin ji îxanet û hest bi îxanetêkirin û îxanetpêkirî! bi cureyek ji cureyan qebûlkirina nezanî û tenegehîştîbûnê, di cîhana aloz ya bidestxistina hewcehiyan bo netewe û nîştimana te bixwe de ye. Di dîroka dîr û nêzik ya Kurd de gellek caran hebûye ku hêz û tevgerê Kurdistanê ew hinda ku li pey berjewendîya xebata xwe bûye, negihîştîye yek ji sed a vê hinda ku hewl dane pêbendbûna xwe bi îdeolojî yan pêwendiyekê atîfî digel ên din biselîmînin.

Gellek caran ew hinda ku me hewl daye ku em biselîmînin ku em pêreweke baş û rast ê sultanê Qacar û Welîyê Feqîh û Sultanê Osmanî û dewleta Rûs û melekê Birîtanyayê û paşayê Erebiyanê û îdeolojiya marksîsm û filan ayîn û îdeolojiyên din bûne, yek ji hezara hindê jî, me hewl nedaye, nîştimana xwe ava bikin, îca carê bila eva bimîne ku her kes peyrevê çi îde û îdeolojiyekê ye!. Lewra têgeha "îxanet li me hatiye kirin", berdewam di dîroka Kurdistanê bi giştî de dubare dibe. Hewce ye ku em baştir ji cîhanê têbigîjin û hewl bidin ku nîştimana xwe em ava bikin.

Desteyeke din ji lawên Rojhilata Kurdistanê, kincê pîroz ê pêşmerge tiyê li xwe kirin

Dewreya 233`an a destpêkî a pêşmerge li ser çiyayên Kurdistanê bi rê ve çû, û desteyeke din ji xortên bibawer ên Kurdistanê çeka piştewaniya ji kerameta neteweya xwe avêtin milên xwe.

Li gora rapora nûçegihanê “Kurdistanmedia”yê, dewreya 233`an a destpêkî a Pêşmerge li ser çiyayên serkêş ên Kurdistanê di merasimeke taybetî de bi dawî hat.

Destpêka vê merasimê bi xwendina sirûda “Ey Reqîb” û ragirtina deqeyekê bêdengî bona rêzgirtina ji riha pak ya şêdan dest pê kir. Piştî birêz Husên Nazdar endamê Heyeta Birêveberî ya Navenda Siyasî ya PDKÎ çend gotinek pêşkêş kirin.

Birêz Husên Nazdar di gotinên xwe de îşare bi vê kir ku PDKÎ her ji destpêka avakirina xwe de girîngî da zêdekirina asta zanyarî, hişyariya neteweyî, siyasî û civakî, ya endamên xwe bi taybetî, û xelkê Kurdistanê bi giştî, û ragehand: PDKÎ perwerde û hînkirin kiriye erkeke herî girîng ya xwe, û perwerdehiya hizbê, li ser bingeha mafê neteweyî û demokratîk ên gelê Kurd, mafê mirov, azadî, demokrasî û dadperwerî hatiye darêtin, û di çarçoveya nixê giran û li gora zirûfa hizbê, û rastiya civaka Kurdistanê, fêrgeha PDKÎ bi awayên cur bi cur û di asta cuda de, berdewam e, û bi hezaran têkoşerên siyasî û nizamî hatin perwerdekirin û pêşkêşî baregeha neteweya Kurd kirine.

Navbirî di beşeke din ya axavtina xwe de ragehand ku PDKÎ di pêxema man û hebûn û rizgarî û azadiya Kurd de xebatê dike, destdirjîyê nake ser tu welatekî, û li hemberî zulm û zordariya tu neteweyeke stemkar de teslîm nabin, û herweha di domê de got: Em şerxwaz nînin, û şer ji bo şer nakin, em parastina rewa dikin bo nehêlana şer”.

Piştî gotinên navbirî, sirûdek li jêr navê “Em Pêşmerge ne”, ji aliyê beşdarbûyîyên dewreyê ve hate pêşkêşkirin.

Di beşeke din ya vê merasimê de rapora perwerdehiya fêrgehê ji aliyê Şaho Xefûrî mamostayê fêrgehê ve hate xwendin.

Paşan peyama beşdarên dewreya 233`an a pêşmerge ji aliyê yek ji beşdarbûyîyên dewreyê ve hate xwendin.

Piştî straneke şoreşgerane ya bi navê “serkewê Rasan” ku ji aliyê beşdarbûyîyêke dewreyê ve hate pêşkêşkirin, xemla beşeke din ya vê merasimê bû.

Herweha di beşeke din ya vê merasimê de, bi ser kesên yekem heya sêyem di warên taqîkariyên siyasî û nizamî û nezm û deseplînê de xelat hatin pêşkêşkirin.

Ew merasim bi çend nimayîşên leşkerî ku ji aliyê beşdaran ve hatin nîşandan, bi dawî hat.



GELO BANDORA ÎRANÊ LI ÎRAQÊ ZÊDE DIBE, YAN GIHIŞTIYE ASTA XWE YA HERÎ BILIND?



NIVISÎN: SETH J. FRANTZMAN

Wergêran ji WWW.JPOST.COM: HEMÎD MUKHTARÎ

Îran di gellek waran li Îraqê de xwedî bandor e. Bandorek ku asta wê piştî hilibjartinên Îraqê di sala 2018-an de ku bû sedema serketina Muqteda Sedr, rêbebrê olînetewî yê Şî'e, hinek hat xwarê.

Rêberê duyemîn-mezintirîn partiya Îraqê, Hadî El-Amirî, çend roj berî niha, piştî rexnegirîng ji seredana Donald Trump, serokê Amerîkayê bo Îraqê, daxwaza derketina hêzên Amerîkî li Îraqê de kir. Amirî, serokatiya partiyekê dike ku bû duyemîn partiya bihêz li Îraqê de, partiyek ku ji aliyê hinek girûpên çekdar yê berê û niha tê piştevanîkirin, ku hinek ji wan tîkiliyek gellek nêzik li gel Îranê hene.

Ev yeka li hemen demê de diqewme, ku "Maj-Gen. Temîr Hayman", serokê îstîxbarata leşkerî ya Îsraêlê, li "Tel Aviv"ê hişdarî derheq geşekirina bandora Îranê li Îraqê de dabû.

Bandora Îranê ku di serdemê serkomarê berê yê Îraqê Nûrî El-Malikî, di navbera 2006-2014'an de, gihîşte asta xwe ya herî bilind. Malikî ne tenê çavdêriya derketina hêzên Amerîkî li Îraqê de kir, belku gorî berpirsên berê yê Amerîkayê, dewleta Obama ew weke kesek bihêz temaşa dikirin û bawer dikirin ku Malikî wê bikare Îraqê piştî kêmbûna hêzên Amerîkî, bi başî bi rê ve bibe. Lê berevajiyê wê, Malikî dijî Amerîkayê derket. Li gorî lêkdanên Waşingtonê, ew helwesta

di wê demê de cihê qibûlê bû, ji ber ku geşekirina neteweparêziyê li dijî Amerîkayê, bi wateya Îraqek yekgirtî li jêr rêberiya rêberek bihêz bû û ew yeka baştir bû ji xendiqandina Îraqê di nava neewlehî û nearamiyê de, ku dibû sedema geşekirina girûpên radîkal.

Lê di rastî de ew nerîna berevajî derçû. Zilm û zordariya Malikî bû sedema lawazbûna kêmaniyên Sunî û Herêma Kurdistanê. DAIŞ û tundrewên mirovkuj, karîni ji valahiya çêbûyî di herêmên Ereben Sunnî de ku bi sedema rêveberiyê şaş ya Malikî û zilmên wî derheq Ereben Sunnî çêbibû, mifaha xwe bistînin û wan deveran bigirin destê xwe.

Piştî ku DAIŞ karî yek ji sê ya axa Îraqê kontorl bikin, ew yeka zext û givaş xist ser Malikî daku Bexdayê cih bihêle. Di yeke-mîn gav de, Malikî îlan kir ku dewleta Obama li pişt çêbûna Dewleta Îslamî ya Îraq-Şam de bû daku hikûmeta wî li Bexdadê hilweşîne. Lê ew ya bi tewahî dîr ji rastiye bû û sûçbarkirina Amerîkayê hêsantirîn rêk bû bo veşartina piroblemên Bexdayê.

Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê di serdemê serokatiya Heyder-El-Ebadî, alîkariya leşkerî da Hikûmeta Îraqê bi taybetî di warê pêgehandinên leşkerî de. Amerîkayê herwiha berpirsariya êrişên esmanî li dijî DAIŞ'ê girt stûyê xwe. Lê belê hemû ew girûpên çekdar yê dijî DAIŞ'ê li Îraqê, zêdetir rêz ji Îranê û rêberên leşkerî yê Îranê digirtin heta Amerîka. Heta hinek ji wan wêneyên Ayetulah Xamineyî di meydana şer li dijî DAIŞ'ê de bilind dikirin.

Dewleta Îslamî ya Îraq-Şamê dest bi kuştin û qetilkirina xelkê li Îraqê kiribû û hêzên leşkerî yê Îraqê ji hev belav bibûn. Girûpên çekdar yê Şî'e jî bi mifawegirîng ji olê, herdem weke mînakek baş mîzeyî Spaha Pasdarên Komara Îslamiya Îranê dikirin bo ji navbirina DAIŞ'ê. Hinek ji wan bi tundî li dijî Amerîkayê jî bûn. Girûpên weke Esahib El-heq ku ji aliyê Qaïs Xezelî ve dihat rêberî



kirin, kesek ku ji aliyê Amerîka ve dema xwe bo heyamekê hatibû destbiserkirin. Yan kesên weke Ebû Mehdî Muhendîs ku ji aliyê Amerîka ve di sala 2009-an de hatiye baykot kirin. Kesek ku tîkiliyek zor nêzik li gel Qasim Sûleymanî û hêzn Spaha Pasdaran heye.

Bi armanca avakirina vê xeyalê ku dewleta Îraqê bi tewahî hevpeymanê Îranê nine, Amerîkayê Bexda tûj kir da ku car din tîkiliyên xwe ligel Erebi-stana Si'ûdî ava bike, û herwiha daxwaz ji welatên kendava Fars kir, ku li Îraqê veberhênanê bikin. Di sala 2017'an, piştî çendîn salan Îraq û Erebi-stana Si'ûdî dest bi avakirina tîkiliyên nû kirin, tîkiliyên ku piştî êrişa Sedam Husên bo ser Kuwêtê di sala 1990'î de bi tewahî qut bibûn.

Dewleta Amerîkayê herwiha daxwaz ji Bexdayê kir ku tîkiliyên xwe ligel Suniyên Îraqê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê baştir bike. Herêmek ku çendîn sal e bi awayek berfireh piştevaniya welatên Ewrûpî dike. Cizîreyek ji aramî di nava Îraqê de ku bi tundî hatiye azardan, û tepeserkirin.

Tîkiliyên Amerîkayê ligel Herêma Kurdistanê di sala 2017-an de ber bi xirabbûnê çû dema ku Kurdan biryara refrandomê ji bo serxwebûnê da. Amerîka ligel Bexdayê kar dikir û piştigiriya Bexdayê kir bo şandina tanakan bo nav Kirkûkê de, ligel girûpên çekdar yê Şî'e yê alîgirê Îranê, bi armanca cezakirina Herêma Kurdistanê. Pêşmergeên Kurdistanê, ji salal 2014 heta 2017'an

Kerkûk ji êrişên DAIŞ'ê paraastin.

Piştî bi dawîhatina şer, Waşington bawer dikir ku ger xwe nêzikê Bexdayê bike û Kurdan bike qurbanîyê vê siyaseta, dikare pêgeha Îranê li Îraqê kêmbike, lê ev siyaseta nekarî rol û hebûna Îranê li Îraqê de kêmbike.

Di rastî de, gorî belgeyên berdest hejmarek zaf ji xelkê Îraqê ji Îranê mandî ne. Di xwenîşandana Parêzgeha Besre de, xelkê êriş kirin ser binkeya gellek girûpên ser bi Îranê. Ew bawer dikin ku sedema sereke ya kirîza aborî li Îraqê de, Îran e ku hemû sermaye wan didize.

Piştî destpêkirina dúbare ya dorpeçên Amerîkayê li dijî Îranê, Îranê sedemên bihêz hene da ku dahata xelkê Îraqê bidize. Miletê Îraqê gazindeya vê yekê dikin ku gellek madeyên hişber ji Îranê tene Îraqê.

Niha Dewleta Amerîkayê car din berbirûyê vê pirsîyarê bûye: Gelo Amerîka dibe li Îraqê de bimîne yan ne? Li gor şarezayên siyasî ku pir nîgeran in li bandor û rola Îranê li herêma de, û hewla Îranê bo avakirina rêyek erdî bo gehîştin bi avê ji rêya Sûriye û Îraqê, lê hêj siyaseta û rola Amerîkayê ne diyar e. Gelo Amerîka wê hewlê bide bandora Îranê kêmbike? Trump îlan kir ku hêzên Amerîkî li Îraqê wê berdewam bin li şer li dijî DAIŞ'ê heta wan ji nav dibin û herwiha dê Îranê jî bixin jêr çavdêriya xwe. Lê Îran jî berdewam e li çavdêrîkirin hêzên

Gelo em çima kêman caran behsa PDKÎ dikin?

هێزی پێشمه‌رگه‌ی کوردستان Kurdistan's Peshmarga Forces



Bûbê Eser

Weke hemî Kurd dizanin, û bûne şahidê vê yekê, ku piştî dabeşkirina Kurdistanê di navbera împaratoriya Osmanî û Persiyan de (1639), cara yekem Hizba Demokrat a Kurdistanê, li qada

çarçira ya Mehabadê de, avakirina Komara Kurdistanê ragehand (1946-47).

Piştî têkçûna Komara Kurdistanê, û heta roja îro PDKÎ nesekiniye, û her şerê azadî û serxwebûna gelê xwe li Rojhilatê Kurdistanê kirine, û dikin û wê bikin jî, heta ku gelê xwe bigihîjin azadî û serxwebûnê.

Em dibînin û bûne şahidê vê yekê, ku di vî şerê dîr û dirêj de PDKÎ gelek bedelên mezin, gelek serok û rêberên xwe jî wenda kirine. Lê tu caran jî bê hêvî nebûne, çî çara fîrset dîtine, her tekoşîna xwe berdewam kirine û dikin.

Partiyeke ewqasî temendirêj, ewqasî tekoşer û ewqas bedel daye, lê ev partiya dilsozê gelê xwe, weke tê xwestin behs û qala wê nahê kirin.

Ez bi xwe bi vê yekê dilşikestîme. Em rewşên gelê xwe dizanin Kurdistan ne bi dilê me hatiye perçekirin. Em dizanin berî 1639'an Kurdistan yek perçe bû. Niha baş tê fêmkirin û zanîn ku dagirkeran bi perçebûna Kurdistanê mejiyê gelê me jî, perçe kirin, Kurd jî hev dîr xistin. Îro rewş êşkere ye ku divê her perçe, berê azadiya xwe bi dest bixe, da ku bikaribe alîkariya birayê xwe yê din jî bikin. Tekoşin û berxwedana PDKÎ li

Rojhilatê Kurdistanê ji ber vê ye. Di vê tekoşîna wan ya dîr û dirêj de pêwîst e em weke rewşên gelê xwe, him bi vê tekoşîna wan serbilind bibin, him jî bi nivîsên xwe, bi piropagandayên xwe ji birayê xwe re bibin alîkar. Divê em vê şoreşa wan ya berê û ya niha di qada navneteweyî de bi deng bikin, da ku dost û dijmin vê bizanibin ku Kurd yek e, û li her derê di her warî de wê alîkariya hev bikin.

Îro tenê dostên Kurdan, Kurd bi xwe ne. Di destê ewil de divê ew alîkariya hevdu bikin, başiyên hev bipesidînin, û şaşiyên hev bi rêyeke dostane rexne bikin. Heta ku Kurd ji Kurdan re nebin alîkar, kesên din nikarin bibin alîkarî. Nasandin bi rêya têkiliyan dibe. Bi qasî dizanim ku têkiliyên birayên me yê Rojhilata Kurdistanê bi Kurdên din re pir ze'îf ango kêman e. Heta ku em nekevin nav hev, heta em bi hev re qise nekin, danûstendinê nekin, em ê weke Kurd baş hev jî nas nekin. Ji berku eva bû zêdeyî 100 salan, ku dijmin bi darê zorê, bi hukmê lêdan û îşkenceyan em ji hev cude kirine.

Çi dema têkiliyên nava me de ne girm bin, mirov jî baş hev nas nake û nikare ji hev re bibe alîkarên baş.

Heger em li dîroka rewşên bîr û nivîskarên Bakurê Kurdistanê binêrin, em ê bi rehetî vê kêmaniyê bibînin. Bi qasî ku em behsa Başûr û Rojavayê Kurdistanê dikin, nivîyê wê behsa rewşa Rohilatê Kurdistanê nakin. Em hemî jî dizanin ku ev bû zêdeyî salekê, ku birayên me bi serpereştiya PDKÎ şerê azadî û rizgariya Rojhilatê Kurdistanê germ kirine. Lê di medyaya Bakurê Kurdistanê û bi gelemperî di medyaya Kurdan de behsa vê nayê kirin û nabe, an gelekî kêman tê kirin.

Em baş dizanin ku piropaganda rêya serketinê vedike. Heger em dixwazin Rojhilatê Kurdistanê bi serpereştiya PDKÎ serkeve, divê em jî ji wan re bibin alîkar. Alîkarî ne tenê madî ye, belku nivîs û gotinek jî ji wan re piştgirî ye.

“Rasan” pirojeyêke nîştimanî û giştîgîr



Dara Natiq

Bizava “Rasan”ê di Xorhelata Kurdistanê ku piştî zêdetir li panzde salan bêdengiya bizava rizgarîxwazî a di vê beşa Kurdistanê de, di sê salên derbasbûyî de karî carek din, doza berheq a neteweya me bixe rojeva siyaseta herêmî û navdewletî de.

Ev bizava han ku rengvedana îradeya şorişgêrî û netewexwazî a xelkê wilatparêz yê Kurdistanê û endam û alîgirên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bû, karî di heyamek kurt de bandorek rasterast li ser civatgeha Kurdistanê danê û tev pêkhatiya netewexwaz a Kurdistanê bixe xizmeta xebata neteweyî û kom-kom keç û xortên welatê me tevî refa pêşmerge û şoreşvanan bibin. Ji aliyekî din ve jî di bin diruşma lihevgerîdana xebata “şax û şar”, karî bajarên Kurdistanê bike navenda sereke a xebat û mîlmilanê li dijî dagîrkerên Kurdistanê û xebata medenî bi piştîgîriya pêşmerge bi avayek berfireh li tev Kurdistanê bi rê ve bibe.

“Rasan” serbarê vejandin û geşekirina bizava rizgarîxwaziyê di Îranê de, bandorek erênî li ser bizava azadîxwazî li seranserê Îranê û xebata netewên bindest di vî welatî de çêkir, û stûnên dîktatoriyeta rejîma dijîmîrovî a



Komara Îslamî a Îranê bihejîne. Bizava “Rasan” cardin ji dagîrkerên Kurdistanê re da eyankirin ku siyaseta tepeserî û asimîlekirin û tunekirina gelê Kurd nikare îradeya neteweyî û mafxwazî a gelê azadîxwaz yê Kurd ji nav bibe û dibe dagîrkariya Kurdistanê êdî bi dawî were û Kurd jî weke tev neteweyên cîhanê li ser axa bab û kalên xwe serbest û azad be.

Bizava “Rasan”ê her di destpêka tekoşîna xwe de, karî çend têfikirîn û aliyên şaş rastî pirsyaran bike. Yekem ev bi nav rêformxwazên di hundire welat ku bi salan bûn xelkê Kurdistanê bi armanca guherîn û rêforma di sîstema rejîma Îranê de dixapandin. Xafil ji vê hindê ku sîstema daxistî û dijîmîrovî a rejîma Îranê tucar nahê guherîn. Û bizava azadîxwazî di çarçoveya sîstemek han de nikare bigehe armancên xwe.

Ye duyem jî, “Rasan”ê ew hêz û aliyên siyasî yên Kurd rastî

tenagiyan kirin, ku bi siyaseta hêjmûnîxwaziya xwe û destwerdan di kar û barên parçeyên din yên Kurdistanê de, û bi çêkirina hizbên sîber dixwastin ku rewayiyê bidin dagîrkerên Kurdistanê, û weke parêzerên berjewendiyên wê rejîmê, dibûne birêveberê siyaseta dagîrkarane ên rejîmê di Rojhilata Kurdistanê de.

Lê “Rasan”îyan, ew yek jî ji tev aliyekî re da xuyakirin, ku ew li ser îradeya mafxwazane a xwe berdewam in, û bi peymanîkirina digel rêbaza Demokrat, siyaseta hêjmonxwazî a ji derveyî îradeya xelkê rojhilat bi tundî red kirin.

Ya sêyem, berbirûbûna siyaseta dagîrkarî û tunekirina rejîmê derheq gelên bindest û yek ji wan gelê Kurd bû. Îradeya mafxwazane a xelkê azadîxwaz yê Rojhilat di çarçoveya tekoşîna bizava “Rasan”ê de, stûnên dagîrkarî û dîktatoriyeta rejîma Îranê hejand, û da eyanê ku siyaseta serkut û tunekirina gelê Kurd nikare tu

**Bizava “Rasan”ê
her di destpêka
tekoşîna xwe de,
karî çend têfikirîn
û aliyên şaş, rastî
pirsyaran bike**

carî pêş bi îradeya netewexwazî a civatgeha azadîxwaz a Kurdistanê bigre, û dibe zû yan direng dagîrkerên Kurdistanê li ser axa bab û kalên me derkevin û kurd di ser axa xwe bi serbestî bijî.

Lewma bizava “Rasan”ê bi organîzekirina tev pêkhatiya Kurdistanê di xizmeta xebata neteweyî de, wê heya gehîştin bi azadî û rizgariya yekcarî a Kurdistanê bi îradeya bilind a keç û xortên Kurdistanê berdewam bike.

»»»» Doma R:4

Amerîkî li Îraqê.

Gellek nîgeranî derheq pêgeha Îranê li Îraqê hene, gellek partî û çalakvanên siyasî yên Kurd û Ereb li Îraqê nîgeran in li rewşa heyî. Wezaretê berevanî ya Amerîka, nîgeraniya xwe derheq girûpên çekdar yên ser bi Îranê li Îraqê de diyar kir. Kongiresa

Amerîkayê daxwaza dorpêçkirina çend berpîrsên eskerî yên girûpên çekdar li Îraqê kir da ku bi vî awayî ew girûpên han nekarin çî mifahek ji alîkariyên leşkerî yên Amerîkayê bo Îraqê bistînin. Lê Waşingtonê piroblemek heye. Wan bawer dikir ku hewildan û sermaydanîn bo avakirina dewletek bihêz ya navendî li Îraqê, wê bandora Îranê kêmkir. Lê heta niha ew yeka rû nedaye. Belku ev yeka dibe ku berevajî

bandora xwe hebe, û zêdetir li berjewendiyê Îranê de be.

Amerîka herwiha nîgeran e ji nîşandana piştevaniya xwe derheq Herêma Kurdistanê û Kurdan û bawer dike ku dibe balans di navbera Herêma Kurdistanê û Bexdayê were ragirtin.

Ger dewleta Trump hewla kêmkirina bandora xwe li Rojhilata Navîn de bide, tenê welatek ku ji

vê derfetê dikare mifah bistîne, Îran e. Ev bandora tenê demekê dê kêmkir be ku welatên kendavê yan jî welatên din karekê bikin û gavekê hilgirin.

Gelo bûyerên ku di herêmê de diqewmin nîşaneyê jordecûna berdewam ya asta rol û pêgeha Îranê di herêmê de ye, yan ev bandora îdî gihiştîye asta xwe ya herî bilind, hêj ne diyar e.

Nerîna Lîderan



“Maïke Pompeo”:

“Emê Li ser dijayetîkirina rejîma Îranê berdewam bin”.



Zerîf:

“Si’ ûdî li pey derbelêdana li me ne”.



Mescidî:

“Şêvirmendên me ên leşkerî di Îraqê de nemane”.



Trump:

“Em Kurdan bi tenê nahêlin”.

Şûjinê di çavên xwe de nabînin!



Selîm Zencîrî

Di demekê de ku civaka Îranê bi giştî û xelkê Kurdistanê Rojhilat, li bin siya dîktatoriya Komara Îslamî ya Îranê de dinalînin û roj nine ku qerqêşe û felaketên cur bi cur nebînin û neceribînin, hejmarek bi nav nûnerên kurd di Meclîsa Rejîma Îranê de nameyek ji NY re, li dijî dewleta Tirkîyê şandine, û daxwaz kirine ku pêşiya gef, êrîş û nejadperestiya dewleta Tirkîyê li dijî Kurdên parçeyên din ên Kurdistanê bigre û hwd...!! Ya ku wan li ser siyasetên qirêj, şovenî û faşîstî yên dewleta Tirkîyê li dijî kurdan anîne ziman, rast û li cihê xwe de ye; lê ger ew hevsoziya neteweyî ya wan carekê cihê pesnê be, durûtî û bazarkirina wan li ser navê kurdan, sed carî cihê şermezariyê ye, lewma ew nameya wan li çend xalan de hewce ye li ser bisekinin:

Yekem; Ew ne nûnerê rastîn ên gel in, ji ber ku di hîlbijartinek azad û demokratîk de nehatine hîlbijartin; belkî ji parzînkarejîmê re derbas bûne û her kes dizane ku girêdayînek rişd bi rejîmê re dikare rê li pêşiya wan veke!.

Duyem; Madam ku ew xwe bi nûnerê gel dizanin, çima zimanê wan li hember dîktatorî û nejadperestiya rejîma Îranê de lalome girîtiye û li ba wan, Îran Şama şerîf e û li Rojhilata Kurdistanê jî, ne ba tê, ne baran?

Sêyem; Ew liv û tevgerên wan vê gotina pêşiyên tîne bîra mirov ku “Bi gur re dixwen, û bi şivan re jî bilûrê lê dixin”. Bi vê wateyê ku ger rasterast jî destê rejîmê di van hemû cinayet û komkujiyan li dijî Kurdan û bi taybetî ên Rojhilata Kurdistanê de nebe, bêdengî û lalomegirtina wan, nîşaneyên razîbûna wan e, û li baştîrîn halet de, siyaseta “zimanê girtî, serê silamet” peyrew û li jêr navê temsîla Kurdan de, bazarê dikin.


Ew îşare bi qedexeya xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî li Tirkîyê de dikin, lê bona xapandinê jî be, ji bîr kirine ku nameya xwe bi zimanê dagîrker nenivîsînin!

Çarem; Ew derziyê li çavê dewleta dîktator a Tirkîyê de dibînin, lê şûjinê li çavên dewleta dîktator a Îranê de nabînin. Wate, rast e Tirkîye cinayetên dike û piştgiriya girûpên terorîstî jî dike, lê rejîma Îranê bi xwe makeya terorê û qutabxaneya hovîtî û şidetê ye. Di rastî de cihê heyrîmanê ye ku ewqas gef û çavsofî, girtin, îşkence, kuştina kolber û ciwanan, îdama azadîxwazan û hwd... ji aliyê rejîma Îranê ve, hesta razayî a wan şiyar nake, yan nabînin!

Pêncem; Ew îşare bi qedexeya xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî li Tirkîyê de dikin, lê bona xapandinê jî be, ji bîr kirine ku nameya xwe bi zimanê dagîrker nenivîsînin! Û eger kesek nebeled be, li nameya wan de wusa fam dike ku kurdên Rojhilata Kurdistanê hemû mafek hene û mafê xwendina bi zimanê kurdî jî li ser destê wan û rejîma wan jî misoger bûye! bêhay ji wê ku asmîlasyon bi hemû qaweta xwe berdewam dike.

Şeşem; Bakûra Kurdistanê hatiye mîlîtarîzekirin, lê eva serê 40 salan e ku Rojhilat jî li jêr siya vê rejîmê de hatiye mîlîtarîzekirin, û ne tenê xelkê Kurdistanê, heta jîngêh û ajelên bêgûneh yên Kurdistanê jî cinayetê wan parastî nebûne!.

Heftem; Ger pêpêskirina serweriya welatên cîran û hewla dagîrkirina wan ji aliyê Tirkîyê jî wan bi nav nûneran re nû be, xwe rejîma Îranê mêjdem e ku serweriya welatên cîran pêpes



kiriye û çiqas şer û dubendiyên li Rojhilata Navîn de hene, sebekar, rejîma terorîstî ya Îranê ye û dews û diruşmên wê gewahyarê vê rastiyê ne.

Heştem; Ew bi nav nûner basa piştevanîkirina Tirkîyê ji girûpên terorîstî ên El-Nusre û DAİŞ’ê li hemberî kurdan de dikin, lê ji bîr kirine ku ew girûp (DAİŞ, Hizbulla, Cehad û hwd....) wekî Spaha Pasdaran zarokên îdeolojîk ên rejîma Komara Îslamî ne, û piştî referandoma Başûr û 16’ê Oktoberê, rejîma ku kistêna wan (dengê wan) li hember de nayê, bi xwe sînor derbas kir û li rasterast û li pêşiya Heşda Şe’ibî û Arteşa Îraqê de êrîşî ser pêşmergeyên Başûr kir û Kerkûk û nîviya xaka Kurdistanê Başûr dagîr kir, lewma ew hevsoziya wan, tenê vê gotina pêşiyên diselimîne ku li rastî de jî “li serwe (rûyekî) de yar in, û binî de jî mar in”.

Nehem; Ew berevanîkirina ji kurdan bi mafê xwe dizanin, helbet tenê sê parçeyên Bakûr, Başûr û Rojava! Wusa dixuye ku kurdên Rojhilata Kurdistanê jî wekî gotina pêşiyên “Pezê bê şivan, risqê gur e” dibînin.

Bi kurtî hêdî-hêdî piropagendeya maşkanêya bi nav hîlbijartina meclîsa rejîmê dest pê dike, û xêra wê jî, zimanê wan jî vedibe, û renga kurdayetiye bi xelkê bifroşin, lê ji bîr kirine ku “Çirayê ku ji malê re hewce be, ji mizgeftê re heram e”. Lewma ew her “palê pûşî ne” û ger:

“Bi sed salî jî bikin xizmeta biyanî Dê her vegerin bi şermezari û peşimanî”, lê êdî feydeyek tunabe.

Zewaca zû û bi Zorî!



Sefiye Xalidi

Zorî û lêdan, ne qedera jinan Ze! Gava qîz an jî lavik ji aliyê dê û bav, an jî malbatê ve, ji bo zewacê bîn tehdîdkirin, an jî li ser wan şidet bê bikaranîn, wî wextî zewaca bizzorê dibe mijara gotinê. Mixabin di civaka Rojhilatê Kurdistanê de, li ser zewaca bizzorê, şideta bi navê “namûs”ê, û zewicîn di temenek kêma de, zan-yariyên pir kêma bi jin û malbatên wan re tê parvekirin! Zewaca bizzorê, rewşa derûnî û tendirustiyê dixê xeterê, û dibe sedema paşmayînê.

Li ber encamên zewaca zû, û bizzorê gelek çarên qîz û kur neçar in dibistanê an jî xwendina zanîngehê di nivî de qut bikin, û dest ji xwandinê berdin. Mixabin ji ber ku rijîma Îranê rêya xwendinê û xebitîn di nav dezgehên dewletî de ji bo xelkê kurd pir dijwar dike, lewma malbat gelek bê hêvî dibin, û rêya xwendinê bi taybet ji bo keçan nadomînin! Rewşa malbatan li Rojhilata Kurdistanê ji ber kirîza siyasî û aborî ya Rijîma Îranê di asteke gelek nizim û xirab de ye.

Malbat ji bo ku jiyana rojane ya xwe derbas bikin, neçar dibin ku gelek biryarên nedirust bidin. Yek ji wan biryarên emotional (êhsasî) zewicandina zarokan di temenek kêma de ye, ji bo ku xwedîkirina zarokan û bicîhanîna daxwazên wan ji bo dê û bavên ji ber pirsgerêkên aborî gelek zehmet e. Heke keçik an jî jinên ciwan, zewaca ji wan tê xwestin red bikin, wî wextî jî zextên malbatên wan bixwe dikevin dewrê, ku li ser navê şerefê, ji lêdanê heta kuştinê diçin.

Heke yek ji aliyan (bûk an zava) bi zewacê neqayîl be, û bêyî raya wê/wî be, an jî ji bo erêkirina zewacê, xwe di bin zextê de hîs bike, ev dibe zewaca bizzorê. Lê gelo xelkê Rojhilata Kurdistanê çî qasî bihayê didin mafê jinan û heya çî radeyekê ser berdevamkirina xwandina keçan dixebitin, û piştgirî dikin, piroseya zewacê çawa pêşve dibin?! Em dikarin zewaca bizzorê bi çend şêweyan pişk bikin, wekî:

- Zewaca ku tenê dayîk û bav biryara hîlbijartina şîrîkê jiyana zarokan didin.
- Zewaca ku endamên Malbatê, weku Mam, Bira û Xal biryar didin.
- Zewaca Jin bi Jin.
- Zewaca bedel xwîn.
- Zewaca li gor şerî'eta îslamê, wekî nimûne dibêjin ku “keç di

temenê 9 saliyê de balix dibe”. Erka hemû Malbatan e ku ser ramana xwe bifikirin û ji ber çav bigrin, ku çiqasî mafê hîlbijartinê didin zarokên xwe û heya çî radeyekê piştgirîya zarokan bi taybet keçan dikin.

Ger ku qîz û kur nekarin hevjinê/a xwe hîlbijêrin, û bi zorê yan li temenek kêma de bizewicin, dibe sedema pêşerojek nexweş û dûr ji armanc, û hêviyên wan, û mifayê ji ciwanîya xwe nabînin, û gelek zû tûşî nexweşiyên derûnî û fîzîkî dibin.

Herwisa rewşa perwerdeya malbatan, perwerdeya civakî, di îro rojê de, li Rojhilata Kurdistanê gelek têkelî baweriyên nedirust û herwiha medyaya bîhanî bûye (Ku tenê taybet bi medyayan e, û xelkê bîhanî belkî qed di jiyana xwe da ser wan tiştan nafikirin, û bikar nahînin, û baweriyek cuda ji baweriyên li medyayan de hene).

Wekî nimûne em dikarin bandora “Facebook”, “Instagram” û kanalên turkî û farsî bi rêya setelaytê ber çav bigrin, Ku gelek çarên bandoreke nedirust li warê hezkirinê, jiyana hevbeş, perwerdeya zarokan, rabûn û rûniştinek mirovane, kar û xebat û



di gelek warên din de hene .

Zewaca zû jî, xalek gelek girîng e ku medyayê bandora xwe li ser kiriye. Em nikarin û çênabe jî, ku medyayê bi kar nehînin, lê gerekî mirov ser baweriyên wan jî bifikire û biaxive, gelo çî qasî nêz û dûr ji kultura kurdewarî ye? Çiqasî me bextewer dike û çiqasî jî me pêşve dibe? Erênî û nerênîya wan ji bo me çîye? Jin nabe herdem di bin emrên endamên malbatê bi taybet bav û birayên xwe de be, belku fêrî vê yekê bin ku bi tena serê xwe biryaran bidin û tecrûbeyan werbigirin.

Lê jinên kurd pêwîstî bi piştgirîya bav û birayên xwe hene. Pêwîst e ku mîrên Kurd, keç, dayîk û hevjinê xwe li jêr sîbera qirêj a rijîmek wek Îranê nehêlin, û bibêjin ku jinên Kurd jî, dikarin mîna jinên Fars, Turk û ...hwd, û baştir ji wan jî di her warekê de serbikevin.

Rejîma Îranê şert û mercan li hember jinan dadinê

Rayedarên rejîmê derheq beşdariya jinan di stadyoman de boçûnên curbicur hene, û hinek ji wan şert û mercan dadinên.

Hadî Sadiqî cihgirê ferhengî ê Dezgeha Qezayî ragehandiye ku her çawan ku jin û mîr dikarin bi hev re herin nav sînema yan parkê, wisa jî dikarin herin stadyomên werzişî de, lê renga çûna wan, du kêşe hebin ku dibe her du kêşe jî bêne çareserkirin.

Hadî Sadiqî derheq egera çêbûna van du kêşeyan de ragehandiye ku di stadyoman de rewşeke nesalim heye, û gellek peyv û gotinên xiran tene bikaranîn, yan jî bêhurmetî bi jinan tê kirin ku ew yek dibe bê çareserkirin.

Mijara duyem jî ew e ku di warê şerî' de dibe çareseriyek hebe. Jiber ku pêka fetwaya lêvegerên dînî, dîtina laşê namehrem bo herdu aliyan dirust nîne. Îca çareserîya vê kêşeyê gellek jî bizehmet nîne, jiber ku me bo jinan jî ew kêşeye di stadyomên wan de hebû, ku me çareser kirin.

Berpirsyarên rejîmê di demekê de hêcetan digrin bo beşdariya jinan di stadyomên werzişî de, ku bixwe bi sedema wan siyasetên xwe ên şaş bûne sedema vê ku jin di civakê de rastî sedan kêşeyên civakî, wekî xwekujî, xemokî, û hawarbirina bo bikaranîna madeyên hişber û karên xeyrîexlaqî bin, ku her hemû jî nediba di civakeke îslamî de hebûna, ku hikûmeteke Îslamî deshlatdariyê dike.

Zêdebûna nerazîbûna rejîm xistiye tengasiyê de

Berfirehbûna rojbirojê zêdetir ya meşên nerazîbûnê rejîm xistiye nava tengasiyêke wisa de, ku li ber bêçareyîya di kontrolkirina wan nerazîbûnan de, her carê tiştekê dibêjin

Li ber siyasetên şaş û dijîgelî ên rejîma Îranê, em şahidê rojbirojê berfirehtirbûna zêdetirya ya meşên nerazîbûnê di nava hemû tex û qatên welat de dibin. Rejîm jî ku êdî nizane çawa dawî bi van meşên nerazîbûnê bîne, hemû rîyan diceribîne. Lê dîsan jî serkevtî nabe û hewl dide bi boxtanên curbicur wekî girêdayîbûna vî xelkê nerazî bi Erebiistan, Amerîka, Îsraîl, û “Dijî Şoreş” (Zidê Inqilab)an, bi hêsanî wan serkut bike.

Her di vê derheqê de fermanderê Hêza Întizamî a Tehranê ragehandiye ku ji destpêka salê ve

heya niha wan zêdetir ji şeş hezar vexwandin ji aliyê “dijî şorş” (Zidê Inqilab)an ve bo pêkanîna meşên nerazîbûnê li dijî Komara Îslamî hebûne. Lê bi xweşî ve me kariye dawiyê bi piraniya wan nerazîbûna bînin.

Husên Rehîmî fermanderê Hêza Întizamî di doma axavtinî xwe de bas ji vê kiriye ku di neh mehên borî de wan 932 meşên nerazîbûnê hebûne, ku bi hewla wan, dawî bi wan hatiye anîn. Wî bona veşartina rastiyan, û dadperwerbûna rejîma xwe û berpirsyarbûn li hemberî xelkê, ragehandiye, ku wan bi fermanderên xwe ragehandine, ku hekî meşeke nerazîbûnê hebe, dibe kesên berpirs bêne derve û bizanin xelk çi dixwaze, û hekî berpirsek amade nebe ji mala xwe derkeve û guh bide daxwazên xwenîşanderan, dibe hûn bi zorî wî ji mal derxin û



berbirûyê xelkê nerazî bikin.

Berpirsên payebilind yê rejîmê her yek ji wan, wisa fêr bûne, ku bona çewtekariyan û veşartina rastiyan xwe pak û dilsoj û xelkî nîşan bidin û hemû jî tawan û kêmîrxemiyên bixin stûyê yektir.

Şaredariya Tehranê hez ji bêgarîkirina bi girtiyan dike

Şaredariya Tehranê daxwaza bikaranîna girtiyan bo paqîjkirina derdorên şaredariyê bi bê wergirtina heqdest kiriye.

Şaredariya Tehranê di nameyekê de ji birêveberên herêmên ser bi paytext daxwaz kiriye da ku bi awayê belaş girtiyan bi kar bînin bona xizmetkirina bi şaredariyê li gor hewcehiyên rojane.

Li gor vê daxwazê, ew girtiyan ku mehkumiyeta cezayî hene, bedela hepsê, wê ji şehrdariyê re bêgarîyê bikin.

Pêştir jî şehrdariyê ew kar kiriye, lê li gora zanyariyan eva heyamek bû şaredariyê ji van girtiyan mîfah wernedigirt.

Lê wisa xûya dike ku zêdebûna xerc bûye sedema vê ku şaredarî bikevin fikra vê pirsê de, ku girtiyan bi kar bînin bona bêgarîyê, da ku ew bikarin dest bi pere ve bigrin.

Heta niha şaredariya herêma 5 ya Tehranê şiyana xwe bo wergirtina girtiyan bona xizmetkirina di beşên navend û binkeyan, dermanê îtiyadê, beşa fenî-hirfeyî, û paqîjkirina cihên giştî, û

şaredariya navçeya 6 jî şiyana xwe bona beşa paqîjkirina derdorê, û karûbarê nobedarî û perwerdehiyê ragehandiye. Herçend ku di yasaya xizmetên giştî ên karê belaş de hatiye gotin, ku ew kiryar dibe bi razîbûna girtiyan be.

Dijberên vê yasayê dibêjin ku ew girtî hekî kar bikin, wê demê pêşiya kesên hewcedarê karkirinê tê girtin û ew nikarin dahatekê xwe re bi dest bixin. Lê karnas ser vê baweriyê ne ku mehkûmên bi hepsê baştîre bedela girtîgehê di nav xelkê de hizûra wan hebe.

Herçend ku perwerdeya girtiyan bona cardin vegehiyana wan bo nav civakê gellekî girîng û hewce ye, lê ji aliyekî ve girtî di girtîgehên Îranê de bedela perwerdehiyê rastî îşkenceyên hovane tînin, û tiştek bi navê perwerdekirinê di gorê de nîne, ji aliyekî din ve jî bêgarîkirina bi girtiyan jî tenê bo şikandina wan û bona nedana heqdestê heyvane bi kedkar û zehmetkên îdareyên hikûmetî ye. Armanca wan ne ew e ku girtî bedela hepsê cardin vegehin nav civakê.

Konseya Çavdêriyê a rejîma Îranê dijayetî digel “CFT”yê kir

Konseya Çavdêriyê piştî pêdeçûna bi ser pejirandiya meclisê wate “CFT”yê, di nameyekê de bo serokê meclisê ragehand ku piraniya kêşeyên ku “CFT”yê digel Yasaya Bingehîn û şer’î hene, hêştî jî nehatine yekalîkirin.

Konseya Çavdêriyê (Şoraya Nîgehban) di nameyekê de bo Elî Larîcanî serokê meclisê ragehand ku piraniya wan dijberiyên ku “CFT”yê digel şer’î û Yasaya Bingehîn hene heya niha jî nehatiye çareserkin. Zerîf Wezîrê Karê Derve ê Îranê berî niha jî derbarê dijberên “CFT”yê ragehandibû: Gellek alî hene ku ji spîkirina pere qazancê dikin. Ew ciyên ku bi qasî hezaran milyardî spîkirina pere hebûye, hetmen ew qas jî şiyana malî hene ku dehan û sedan milyard Tûmenî jî bikin xercê piropagendeyê ji xwe re”. Ew axavtinên Zerîf pêwendî bi kêşeyên navxweyî ên kes û alî û bask (cinah)ên nav hikûmetê de ye, ku her yek ji wan li gora berjewendiyên aborî û siyasî ên xwe, pirsên weha girîng şirove dikin, yan jî dijberî dikin yan jî digel de ne.

Meclisa rejîma Îranê pêdeçûn û karkirina li ser pirojeyasaya tevlihbûna Îranê bi “CFT”yê re, çend mehan berî niha dest pê kiribû, lê pejirandina wê, bi sedema dijberiya hejmarek ji nûneran kete derengiyê. Tirsî rejîmê jî vê ye ku bi pejirandina yekcarî ya vê pirojeyasayê, êdî ew nekarin bi hêsanî alîkariya girûpên terorîstî bikin û pere bidin wan.

Çîroka “Mem û Zîn”ê bi du zimanên zindî ên cîhanê hatin wergerandin

Çîroka naskirî ya “Mem û Zîn”ê ji zimanê Kurdî ve bi du zimanên Îngilîzî û Almanî hatin wergerandin.

Çîroka evîndariya “Mem û Zîn”ê ji nivîsîna Ehmedê Xanî helbestvanê mezin û navdar ê neteweya me ji aliyê Feryad Fazil Umer û Navenda Lêkolîna Kurdî ve li Birlînê hate wergerandin bo ser du zimanên Îngilîzî û Almanî.

Ehmedê Xanî (1651-1707) helbestvan û nivîskarê Kurd bû. Ehmedê Xanî ji wan yekem kesan e ku li ser kurdayetiyê û netewewaziyê Kurd nivîsandîye. Mem û Zîn berhema herî naskirî û navdar ya Ehmedê Xanî ye ku çîrokeke evîndarî ye, ku di sala 1692`an bi zarawayê Kirmancî hatiye nivîsandin.

“Mem û Zîn” çîroka evîndariya dilêş ya kurekî ye bi navê Mem, û keçekê bi navê Zîn, ku Ehmedê Xanî helbestvanê mezin ê neteweya me, di sala 1692`an de, li ser bingeha çîrokek rastîn bi zarawayê kirmancî nivîsandîye, û kiriye mesnewiyê binirx û dirêj. Xanî bûyerên nav dastanê di 2550 xetan de darêtiye. “Mem û Zîn” a Ehmedê Xanî yek ji berhemên herî girîng ên wêjeya kilasîk ya zimanê Kurdî ye. Yekem car di sala 1919`an de li Stenbolê hatiye çapkirin, û Hejar helbestvanê neteweya Kurd her bi vehunandin ew yek wergerandiye ser zarawayê Soranî.



Berhemên Xanî pêk tên ji: Eqîdeya Îmanê, bi pexşan û vehunandin, li ser pênc pêpkên îmanê ye di Îslamê de. Di sala 2000`î de li Swîdê hatiye çapkirin.

Nûbuhara Biçûkan, sala 1683, ferhengoka Erebi-Kurdî ye ku bi helbest bo zarokên Kurdî daniye, ku fêrî zimanê Erebi bin, ku wê serdemê, zimanê dîn û zanistê bûye. Yekem car di sala 1919`an de li Stenbolê çap bûye. Dîwana Ehmedê Xanî ku pêk tê ji xezel û qesîdeyan, ji aliyê Abdulrehmanê Durre ve hatiye şirovekirin.

Li Îranê îşkencegeran helbestvanek dane ber şelaqan

Li Îranê îşkencegerên rejîma Laxûndî helbestvanekî bajarê Xoyê bi awayekî hovane dane ber şelaqan.

Li gora kempeyna piştvanîya ji girtiyên siyasî û medenî, roja Yekşemiyê 2`ê Befranbarê hukmê 74 derbên şelaqan ya Mihemed Husên Sodager helbestvan û rexnegirê Azerbaycanî ku pêştir ji aliyê liqa 103 ya dadgeha keyferî ya 2 ya şaristana Xoyê ve bi tohmata belavkirina derevan hatibû birîn, di dadseraya vî bajarî de hate cîbicîkirin.

Çavkaniyeke agehdar di vê

derheqê de ragehand: Wî hukmî pêwendîya wê bi dozvekirina (şikayeta) sala derbazbûyî ve hebû, ku serokê şevra bajarê Xoyê bi navê Mecîd Muqedem gilîname (şikayet) li dijî Mihemed Husên Sodager helbestvan û rexnegirê Azerbaycanî ji dadgehê re şandibû.

Mihemed Husên Sodager helbestvan û rexnegirê Azerbaycanî di mijarekê de gotibû ku wî bawerînameya dukturayê tuneye, û tenê “master” heye, lê di posterên piropagandeya hilbijartinan de xwe wekî duktura bi nav kiriye. Berî cîbicîkirina hukmê

şelaqlêdana vî helbestvanî, beşa cîbicîkirina hukmên dadgehê pêwendî digel navbirî girtibû, lê navbirî amade nebibûp here dadgehê, lewra wezîfedarên emniyetî êrîşî ser mala wî dikin û wî destbiser dikin û dibin dadseraya Xoyê, û li wir hukmê şelaqlêdana wî cîbicî dikin.

Lêdana şelaqan li vî helbestvanî bûye sedema dijkiyarên tund ji aliyê çalakên Azerî ve.

Çalakên mafê mirovan



radigehînin ku ew kiriyara hêzên emniyetî şikandina kerameta mirovan û îşkenceyeke hovane ye.

Zimanê Kurdî

2- Bi karên nederhingêv re :

Cînavên koma (min) li pey karên nederhingêv jî tîn û dibin berkarên nerasteder :

- Em çûn pêşingehê, ma hûn jî çûne wê (çûnê) ? - Stêr balkêş in, ku awira min dikeve wan

Ez seyr dimînim.

- Em gihiştin wan .

3- Li pey navan :

Cînavên koma (min) li pey navan û bi alîkariya zêderên pendiyê (nasînê), “ê, a, ên” bikar tîn.

Wek :

- Hevalê min mişext bûye.
- Hevala te li kû maye ?
- Hevalên wî, wê çûne seyrangehê
- Dostên me, we, wan tev bûne penaber

Zêderên nependiyê “ekî, eke, inî, ine), ew jî girêdanekê di navbera nav û cînavên koma (min) de dirust dikin .

Wek :

- Hevalekî min mişext bûye (nêr).
- Hevaleke te xuya nabe (mê)
- Xortinî me çûne seyranê()
- Keçine we, wan çûne seyranê

4- Li pey pêrbestan (daçekan) :

Cînavên koma (min) di pêvajoya hevokan de, li pey pêrbestan jî tîn xebitandin. Wek :

- Baranê li min kir
- Sosin bi te re axivî
- Min ji wî, wê re helbestek xwend
- Tiştêkî ji me re bibêje, em ê jî dilê xwe
- ji we û ji wan re vekin

5- Li pey hevalkaran (hokeran) :

Li pey hevalkaran jî cînavên koma (min) bikar tîn.

Wek :

- Ew hevalê nêzî te, ji kû ye ?
- Tu dûrî min ketiyî
- Asmanê şîn di ser me re ye
- Em li rex we rûniştî bûn

Têbînî :

1- Heger ev her dû cînav (wî, wê) li pey van pêrbestan : (ji, li, bi, di) bêne xebitandin, hingê ew cînav bi

kurtebirrî dibin (ê) :

- (Ji) : (ji + wî, wê = jê) - Serdar ji hevalê xwe re got. (Serdar ji (wî) re got) (Serdar (jê) re got) - Zîn ji hevala xwe re dibêje (Zîn ji (wê) re dibêje) (Zîn (jê) re dibêje) - (Li) : (Li + wî, wê = lê) - Serdar li gund dimîne

(Serdar li (wî) dimîne)

(Serdar (lê) dimîne) - Zîn li dibistanê ye (Zîn li (wê) ye) (Zîn (lê) ye) (Bi) : (Bi + wî, wê = bê = pê) - Ez bi Salar re çûm (Ez bi (wî) re çûm) (Ez (pê) re çûm).

- Zîn bi dayika xwe re ye

(Zîn bi (wê) re ye) (Zîn (pê) re ye) Di vê mînakê de tîpa (b), bi egera sivikbûnê bûye (p). - (Di) : (Di + wî, wê = dê = tê) - Malek di gund de nemaye (Malek di (wî) de nemaye) (Malek (tê) de nemaye) (Sêvek di darê de pijiya ye) (Sêvek di (wê) de pijiya ye) (Sêvek (tê) de pijiya ye). Tîpa (d) jî, bi egera sivikbûnê bûye (t). Ji hêla dengsaziyê (fonîtîkê) ve, ev pêrbest (ji, li, bi, di) bi dengdêra (i) kuta dibin, vêca ku (ê) ya kurtkirî dighêje wan, (ji + ê, li + ê, bi + ê, di + ê) aloziya (2) dengdêrên li pey hev (i, ê) berçav dibe. Hingê dengdêra pêşîn (i) tê avêtin : (j...ê, l...ê, b...ê, d...ê) û dibin (jê, lê, pê, tê).

2- kurtebirriya van her dû cînavan (wî, wê) li pey

karan jî dirust dibe :

- Min pertûkek da Rizgar (Rizgarî) (Min pertûkek da (wî) (Min pertûkek dayê) - Rizgar avê dixê perdayê (Rizgar avê dixê (wê) (Rizgar avê dixê) Şarezayên zimanê kurdî (K.J), li ser vê diyardeya cînavan rawestiyane û ev cînavê kurtebirrî (ê) bi van navan destnîşan kiriye : - Celadet Bedirxan navê “pronavê lihevxiştî” lê kiriye. - Reşîd Kurd : “bernavê bêhêl” - Kamîran Bedirxan : “pronavê kurtkirî” - Sadiq Behadîn Amîdî : “cihnavê bêhêz” Ji hêla parvekirina rêzimanî ve jî, ev cînav di hemû raweyên hevokê de cihê navên berkarên nerasteder digre. Anku, berdewam ev cînav berkarê nerasteder e.

Dom heye..

Agirî

- ◆ Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (341)

Beşdarên dewreya 233 ya destpêkî a pêşmerge cilûbergê pîroz ê pêşmergegiyê li xwe kirin

